

KOMELEY XWENDIKARANÎ KURD LE EWRUPA

(Kurdish Students' Society in Europe)

KSSE C/O Asad
P.F. 301 503
1000 Berlin 30



Bîranîna Soresa Çardehê Gelawêja sala 1958

Di Çardehê Gelawêj de, sala 1958, gewretirîn şoreşa berciwaziyî demokrasî li Iraqê bû. Vê Şoreşa pîroz tevaya sustêma derbegyê û patîşahyê ya go bi Impiryalizma Ingilîzî ve girêdayî bû herifand. Bû şahî û bextiyarî li seranserî Iraqê. Gelê Iraq, bi Ereb, Kurd û Kemayên Milî, tev bicarekê li dora ala Şoreşê xwe dane hev. Durjmê Dostanyê û biratyê di nava hemû Miletê Iraqê de berz û bala bû. Xebateke geş ya cemawerên Iraqê dijî Impiryalîstiyê û kevneperestiyê destpêkir. Peymana Bekdad hate ruxandin. Miletê Iraqê cara pêşîbû çarenûsê xwe xiste destên xwe. Komara Iraq bû Komara Ereb û Kurd; herdu tede beşdarbûn mina hev. Berzanî, Qehremanê Miletê Kurd, li gel Hevalên xwe, piştî derbideriya sêzdeh salan vegerya nava welatê xwe. Hêviyek mezin li pêşiya Gelê Iraqê vebû ji bona ayindanek xweştir. Impiryalizim û kevneperestiyê vîlik û pîlan li dora Şoreşa pîroz gerandin, lê tevaya gelê Iraqê bi vî û evîneke xurt beramberî tepên dujminên şoreşê rawestiyar û bi serfirazî, bi mîrxasî radiwestiyar. Impiryalizim û kevneperestiyê destê xwe avêtin şovinîzma Erebî, ew beramberî tevaya hêzên pêşverû û demokrat rakirin û ew harkirin bona birina şerekî man û nemanê ser Kurd di 11. Îlula sala 1961 de. Weha careke din gelê Kurd neçar bû li ber man û nemana xwe bide. Bi vîxistina vî cenga nerewa beramberî Gelê Kurd li Kurdistana Iraqê Şoreşa çardehê gelawêj ya pîroz hate dawîkirin, bîyî ew bigihe armancên xweyî welatî. Basiyên faşiyên beşa di 2. şubata sala 1963 de bi tirênek Emerîkî hatin ser desthilatiya Iraqê. Ev roja han rojeke reş e di mêjuwa Iraqê de. Bi hezaran faşiyên basî ji Demokratên Iraqê tola xwe vekirin; jiber ew welatperwer bûn, dijî Impiryalizim û kevneperestiyê bûn. Agirê cenga wêrankirinê careke din bi xurtî li seranserî Kurdistan dadan; bajar û gundên Kurdistan wêrankirin; bi hezaran ji law, keç, pîr û kalên Kurdistan kuştin. Tev li vî dirbûna han careke din Gelê Kurd di bin rêberiya Berzanî de beramberî dacrkerên Kurdistan bi qehremanî rawestiya. Qehremaniya Gelê Kurd ji bona liberxwedanê bû nimûne. Tevaya hêzên Pêşverû, Demokrat û Aşitîxwaz ji dil û can piştî Gelê Kurd di vî xebata welatî de girtin.

Iro Gelê Iraqê bi carekê di gewretirîn tengayî re derbas dibe. Rejîma Sedamê Tekrîtî di 22.9.1980 de cengek nerewa, ku bes û bi tenha qazanc û berjewendiya Impiryalizma Emerîkî û kevneperestiyê tede heye, beramberî Gelên Iranê vîxist. Di vî cenga han de bêtir ji sedhezari kuştî, sedûpênçî hezar birîndar û şêst û pênc hezar dîl, ku di nava wan de bêtir ji pênc hezar Efserên Iraqî, herwehâjî bêtirî wan jimaran jî ziyana Gelên Iranî bû. Tevaya hêzên pêşverû û demokrat li Iraqê durujmê ruxandina vî rejîma faşî berz kirine, daxwaza wan Demokrasî ji bona Iraqê û Ewtonomîyek rast û durust ji bona Kurdistanê.

-Herbijî Şoreşa Çardehê Gelawêj !

-Herbijî Dostanî û biratî di nava Gelên Iraqê de !

-Ruxandin û mirin bona Rejîma Sedamî faşî !

Sekretariya Komela Xwendekarên Kurd li Ewropa

- KSSE -

14. Gelawêj/1984